Dumahîk: Li Sûriyê….

kar û barê komele û partiyan , qedexekirin û bi her hawî rêgirtina li ber karê rojnamevanî û ragihandinê , bi serde jî girtin û zorkirin li çi kesê ku nerazîbûna xwe ji vê rewşê heyî re bide xuyakirin , hêştiye û dihêle ku gelek, tişt li Sûriyê bervaja bêne fêmkirin , veşartin , têkilhev û bincil bibin .

Ji navîna meha Avdara borî û bi vir de , doz û daxwaza azadiyê di nav civaka Sûrî de gol vedide , liv û tevgereke xwepêşandanên aştiyane li hinde parêzgeh , bajar û bajarokan destpê kiriye , nemaze li başûrê Sûriyê , nêzî sînorê Urdinê , parêzgeha Der'ayê . Lê mixwabin , karbidestên rijîmê , ne tenê bi tund û tûjî , lê belê , bi kuştin û xwînherikandinê , xwestin wan xwepêşandanan ji ber hev bixin û bela wela bikin . Lê zû bi zû bi ser neketin û xwepêşandan berfirehtir bûn û her çû xwîn herikî , Tank û Panzêrên artêşa dewletê jî derbasî holê bûn , hejmara kuştî , birîndar û girtiyan her çû pirtir bû , û digel şêweyên ragihandina germkirin û gurkirina rewşê , û piropaganda bêserî û bêbinî , diruşmên xwepêşandaran ji doza azadiyê derbazî doza roxandina desthilatdariyê bûn.

Gelek malbat û hemwelatiyên Der'ayê koçber bûne , sînorê navnetewî ya Sûrî – Urdinî derbas kirine û îro roj li hêla Urdinê bi cî dibin , weke çawa dora 240 kes ji hemwelatiyên Sûrî yên Turkmen ji parêzgeha Latakiyê koçber bûne û derbasî Turkiyê , li wîlayeta Hatay – Îskenderonê bi cî bûne . Lewre jî , gelek nêrîn û helwest , semîner , daxuyan û manşêt di derbarey rewşa Sûriyê de, di medya yê de cî digrin … Çavdêr , siyasetmedar û rojnamevan bûyeran dişopînin , gelo ka berê Sûriyê li kû ye ? , û wê çi biqewime ? .

Hêz û dewletên Rojhilata Navîn , bi taybetî Turkiyê , Îran , Îsra'îl , Hemas û Hizbula , bi çavên vekirî û guhên bel , li rewşê mêze dikin , diponijin û ne dûre tevdîran distînin .

Yekîtiya Ewropî , rêvebiriya Obama , Bankî Mon û encûmena navnetewî ya mafên mirovan li Cinêvê , hemî bi dengên aşkere û zelal doz dikin ku hikumeta Sûriyê , van kiryarên xwe yên nemirovane bide rawestan , bê erê û na , bê dudilî , xwînrijandinê li dij hemwelatiyên xwe rawestîne , guh bide daxwazên gelê xwe û di zûtirîn dem de , xal û bendên lixweveger û rêformê cî bi cî bike .

Gelê Kurd li Sûriyê digel partiyên tevgera xwe ya siyasî ya niştimanî , ne di guhê gê de ye , duh jî , îro û sibe jî , û ji berî van hemî xwepêşandanên ku li hin deverên Sûriyê rû didin , her û her piştgir bû û her dê piştgir be , bona hemî doz û çalakiyên demokratîk û aştiyane li seranserî Sûriyê . Ji ber ku bawerî li cî ye ku , Kurd bi tevgera xwe ya siyasî , par û birek ji tevgera Sûrî ya niştimanperwer , demokratîk û aştiyane ye , û jê cuda nabe . Lewre jî, divê di biryaran de hevpar be , û çendî Sûriyê bi xêr be , Kurd dê bi xêr bin . Ango, çendî gavên demokrasiyê cî bi cî bibin , ewqas hemî dê li karê bin .

Parastina pêvajo û berjewendiyên gelê Kurd û çareserkirina pirsa wî ya netewî di siha heyameke demokratîk û aştiyane de ciyê xwe digre , û em bivên nevên , çendî dijayetî , kîn û kudret , kuştin û xwînrijandin li dar be , ewqas nexweşiyên şerxwazî , nijadperestî û paşverûtiyê serî hildidin û civak li şûn dimîne . Dem ne dema şoreş û bersivdana bi tivingan û xwînherikandinê ye , dema me ew e ku , çareserkirina hemî pirs û pirsgirêkan divê bi rêbazên aştiyane , bi diyalog û hişmendî be .

Em di wê baweriyê de ne ku pêşeroja Sûriyê ne ji siyaset û rijîma tek patiyê re ye .

4.05.2011

Mihyedîn Şêx Allî
Sekretêrê Parta Yekîtî ya
Demokrat a Kurd li Sûriyê .